

## Bajarê Jinebiyan

Hêvîdar Zana

Dema min rapora taybet ya li ser vê babetê xwend, xwîn di damarên laşê min de cemidî. Min ji ber xwe ve şerm kir, weke ku ez sebeba trajêdiya wan jinebiyan bim. Rapor pir berferah e û rewşa jinebiyên Hindî bi hemo aliyên wê ve radixe ber çavan.

Bajarekî mestîmezî tije jinebî bûye, jinebiyên ku ji aliyê malbat û civakê ve hatine avêtin. Ew 150 kîlometryan dûrî Dêlî ye. Navê bajar Vrindavan e. Jinên ku mêrên wan mirine û dimrin, berê xwe didin wî bajarî. Bi tenê ew bajar wan dihebîne. Hinek ji wan di destpêka temenê xwe de ne, hinek navsere û pîr in, lê çarenivîsa tevan yek e. Tawana wan ewe ku ew li welatekî weke Hindê jinebî ne. Ez ji civaka xwe de dizanim ku barê jinebiyan giran e, lê min nizanibû ku jinebî tawan e.

Li gora raporê, li Hindê û di nava baweriya Hîndûsî de jinên ku jinebî dimînin, weke pîrebokan tene dîtin. Êdî dawî li jiyana wan ya civakî tê. Bi tenê bajarê Vrindavan hembêza xwe ji wan re vedike, ewên ku êdî tu kes wan naxwaze.

Tê gotin ku bi daketina êvarê re, dema ku reş dikeve erdê û êdî mirov nikare wan bibîne, ji cihên xwe derdikevin û berê xwe didin perestgeha mezin. Bi meşeke lawaz, weke ku bi avêtina her gavê re lêborîna xwe ji jiyane bixwazin. Bi tenê segên kolanan şahidê wan in.

Ew dimeşin heta ku digihîjin perestgeha Hîndû. Ew perestgeha ku bi sedan jinên weke wan li hewşa wê rûniştine û li hêviya gepek nan in. Her şev beriya ku serê xwe deynin û têkevin xew, dû'a dikin ji bo ku roja din hişyar nebin. Li mirinê digerin, lê bi dest nakeve.

Wan li gel mêrê xwe, hemo mafên xwe yê civakî jî wenda kirine. Kesek naxwaze nêzîkî wan bibe, ji ber ku wan bêoxir dibînin. Tê gotin ku wan serê mêrên xwe xwarine û divê berdêla wê bi êş û azarê bidin.

Li gora adetên Hîndû, jineke ku mêrê wê bimre, divê di temamê jiyana xwe de şînî be û temamê porê xwe bibire ji bo ku ji mêrên din re ne balkêş be. Her wiha divê xwarina wê jî pir sivik, bê goşt û biharat be ji bo daxwaza wê ya cinsî zêde nebe. Xelk wan ji nava xwe davêje, ji ber ku li gora wan, siya wan jî bêoxir e û dikare felaketan bîne serê mirov. Ew di ber mirina mêran de sêdar tene dîtin. **Hikûmeta Hindê li gora yasayê mûçeyeke pir hindik (mehane nêzîkî 10 dolaran) dide jinebiyan. Lê haya gelekani ji wan jî vê mûçeyê û yasayê jî tune ye. Karkirina jinan jî xwe bi awayekî giştî li Hindê kême, îcar ji bo jinebiyan qet tune ye.**

Tu kes bi jinebiyekê re nazewice jî. Hinek ji wan hîna 17 salî ne, lê êdî dizanin ku jiyana ji bo wan roja mirina mêrê wan rawestiya ye. **Rapor behsa rêxistineke civaka sivil dike ku li ser rewşa jinebiyan radiweste û dixwaze derfetên jiyane li pêşiya wan fereh bike. Berpirsyara rêxistinê Mohini Giri dide zanîn ku rojekê riya wê dikeve bajarê Vrindavan û dibîne ku cenazeyê jinekê li kolanan ji aliyê segan ve tê perçekirin, lê tu kes naxwaze ji erdê rake û binax bike, ji ber ku ew cenazê jinebiyekê ye. Ew dîmen dihêle ku Xanim Giri sitargehekê ji bo jinebiyan veke û dest bavêje vê pirsgerêkê.**

Niha 120 jinebî li wê sitargehê dimînin, rojê sê caran xwarinê dixwin, nexweşiyên wan tene dermankirin û weke mirovên ji rêzê tene dîtin. Tê gotin ku 33 milyon jinebî li Hindê hene û piraniya wan li kolanan di rewşeke pir xerab de dijîn. Li cem me, herçiqasî di aliyê aborî de pirsgerêk hebin jî, qedir û qîmeta jinebiyan tê girtin û civak bi her awahî xwedî li wan derdikeve. Xanima ku piştî mirina hevjinê xwe li ser zarokên xwe bimîne û careke din nezewice rêzeke taybetî jê re tê girtin. Bi kêmanî li devera ku ez jê hatime, wisa ye. Ez bawer nakim li tu dever Kurdistanê jî jinebî xerab û kême werin dîtin.

Li dawiyê ez bi tenê dikarim vê bêjim; Xwedê neke ku tu jin li Hindê jinebî bimînin. Amîn.

**Têbîn:** *Ev nivîs li Hewlêrê bi soranî di kovara Warvîn de hatiye weşandin*

**Ev gotar ji malpera Avesta hatiye girtin**